

R: 2
### Berbirûbûna opozîsyona kurd bi rejîmê re



R: 4
### Bandora dorpêçên aborî û dijwarbûna jiyana xelkê




R: 6
### Kurd divêt bi hişyarî tev bigerin




R: 8
### Hûn derbarê Kurdên Îsraîlê de çi dizanin?



Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 181
19'ê Nîsana 2012'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Bi boneya 114'hemîn salvegera rojnamevaniya kurdî**

Li 114'hemîn salvegera bilavkirina yekemîn rojnameya kurdî ku li bin navê Kurdistan û bi hewl û tekoşîna Miqdad Midhet Bedirxan li Bajarê Qahirê de hat weşandin, em rêz ji tewaya wan pênûs bidestan digrin ku ji bo geşandin û pêşvebirina rojnamevaniya kurdî çalakî hebûne û di hewla gihandina zaniyariyên durust bo xelkê xwe bûne.

**Desteya weşana Agirî**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Kilînton:

# Pilana Enan dawîn derfet bo rejîma Esed




Hîlarî Kilînton, Wezîra Derve ya Amerîkayê ragihand ku rewşa Sûriyê gihaye qonaxekê ku divê Esed êdî tund û tûjiyê bilez bide sekinandin, nexa Amerîka riyên din bona givaştina rejîma Sûriyê dê biceribîne. Herweha got ku li vê riyê yan emê biser bikewin û aştiyê li deverê de bicih bikin yan Edes derfeta dawîn ji dest dide.

Eve jî li halekê de ye ku pêka pilana Enan gurûpek ji çavdêrên NY derbasî Sûriyê bûne û li ber çavê wan tund û tûjî û cinayetên rejîma Esed li dijî xwenîşander û azadîxwazên Sûriyê her berdewame.

Pêka rapora rêxistina çavdêrên mafê mirov heya niha zêdeyî 11 hezar kes bi destê hêzên Esed hatine kuştin.

Ji hêla din ve jî hevjînên her yek ji balyozê Birîtanya û Alman li NY li peyamek vîdyoyî de daxwaz ji Esma Esed kirin ku nebe temaşavan û daxwazê ji hevjînê xwe, Beşar bike ku kuştarê rabigre.

Li beşek din de jêre gotine ku dema ku tu zarokên xwe hembêz dikî û radimûsî û şevxweşê ji wan re dibêjî, hin jin hene ku ciyê zarokên xwe vala dibînin û rondikê bixwîn jêre dibarînin.

## Sergotar

### Hewcehiya hevpar bo kirrîna demê

**Selîm Zencîrî**

Take lihevhatina eşkere ya gurûpa 5+1 û Îranê li Stenbolê (14'ê Nîsanê), diyarîkirina dema rûniştina duyem piştî mehek din li Bexdayê de ye. Derfetek ku tev aliyan hewcehiyek hevpar li gor rewşa navxweyî a xwe jêre hebûn.

Li Amerîkayê de hilbijartina serkomariyê li pêşê ye, û Îdareya Obama ku xwe bi mîmarê dîplomasiya Hûşmend (ceza û handan) dizane, hewil dide ji şikesta ji rikeberê xwe ê bihêz (Komarîxwazan) xwe biparêze. Lewma naxwaze zêde pişta Îsraîliyan bigre û rû ji şerek nexwastî li dijî Îranê li vê rewşê de bike.

Ewropa jî naxwaze li rewşa aloz a nihaye aborî de, kirîzek nû li welatek mezin û dewlemend de biafirîne ku tesîrek nerînî li ser aboriya wan hebe û kirîza xwe kûrtir bike.

Rûsiya jî nîgeranê ji detsdana pêgeha xwe de ye li egera êrîşa ser Îranê, çûnkî ji her alî ve tê dorpêçkirin û rojava serdest dibe. Eva jî kabûseke jêre ye.

Îsraîl jî ku nîgeranê rewşa Sûriyê ye ka dê bihiloşe û ji Îranê veqete yan na? Çûnkî ger wê demê êrîşê jî bike ser Îranê, renge hezîneyek kêmtir ji niha jêre hebe.

Îran jî ku derfetek din bidest dixe bo pêşvebrina pirograma xwe û herweha pêşîgirtina ji givaşên zêdetir. Lewma ev antirakta 40 rojî aramkerek bû bo hemû aliyên têkildar bi vê kirîzê û bi terzekê hemûyan razî dike.

### Dîplomatek Îranî li Birizîlê bi tawana azara cinsî a zarokan hat girtin

R: 2



### Hejmarek ji qutabxaneyên Bokanê ji ber xirabiya rewşa ewlehiyê hatin daxistin

R: 2



www.arsivakurdi.org

# Mistefa Hicrî: Gefên leşkirî bêencam in û nabine sedema guhertina rejîmê

**Kurte raporek ji dîdara birêz Mistefa Hicrî û birêz Fabiyan**
**Wergeran ji Îngilîzî: Rêbwar Fanî**
**Bo kurdî: Agirî**

Li 9'ê Reşemeya 1390'î de, birêz Fabiyan derfeta dîdar û hevdîtina wî ya bi Birêz Mistefa Hicrî, sekreterê giştî ê PDKÎ re pêk hat. Dîdara han piştî sefera vê dawiyê bo kurdistana Îraqê ku nîştimana gelek ji kurdane, pêk hat. Li vê dîdarê de derfetek ji bo got û bêj û guhertina bîr û hizran û li dor rewşa aloz a Îranê li pêwendî li gel ber bi rû bûna bi opozîsyona rejîmê re ku bi awayek hovane tê serkutkirin û herweha li vê biyavê de ku berpirsiyarên rejîmê li pey xurtkirina teknolojiya navikî ne bi armanca şerxwazane, li navbera wan de pêk hat.

Hicrî heya niha li çendîn pîlanên terorîstî rizgar bûye ku ya herî dawîn jî li sala 1386'ê de li dijî wî birêve çû. Serbarê wê jî birêz Hicrî hêj bi awayek lêbrawane piştewan û berevankarê hikûmetek demokratîk û sekolar li Îranê de ye.

Hevpeyvîna han li ser gazî û mêvandarîtiya birêz Fabiyan ji Kek Mistefa li hola Parlemana Birîtanya de birêve çû. Kek Mistefa li vê dîdarê de bîr û ra û ramanên xwe li pêwendî li gel rewşa niha ya Îranê bi wî re xiste ber bas. Fabiyan, endamê parlemanê û kesekî şehrezayê rewşa Rojhilata Navîne û girîngiyekî zaf bi rewşa rû ji geşe û ber bi pêşve ya Îranê dide.

**Birêz Hicrî dibêje ku:**

**1:** Reform û çaksazî li rejîma niha de nemumkin e. Binav hilbijartina vê carê eva selimand. Rejîm tenê bona

**Li cihê hewildan bo guherandina siyaset û reftarên rejîmê, dema wê hatiye ku hizir ji çawaniya guherandina rejîmê bikin**

çewaşekarî û nîşandana rewatiya xelkî a xwe hilbijartinan pêk tîne. Her çawa be ji ber wê ku hilbijartin azad û dadperwerane ninin, rejîm nikare ew rewatiya ku îdiaya wê dike, bidest bixe û vê rejîmê piştewaniya xelkê pêre nine. Ger rejîma Komara Îslamî bi piştewaniya zorahiya xelkê pişt qahîm bûya, dê îzna hilbijartinek azad û dadperwerane bi xelkê re bidaba.

**2:** Baykotan bandor û tesîrek berbiçav li ser aboriya Îranê danîne. Buhayê pereyê Îranê li hemberî dolar de sedî 40 daketiye û eva jî bûye sedema daketina asta sermiyandanînê. Serbarê wê jî asta berhemanîna neftê bi awayek ber bi çav kêm bûye û asta bêkariyê bi awayek ber bi çav zêde bûye.

Lewma em dikarin bi vê encamê bigihîjin ku nerazîbûna xelkê bi nîsbet rejîmê ji ber baykotan zêde bûye. Her çend ku rejîm hewil dide sedemên rewşa aloz û lawaz a aborî bixe stûyê welatên rojavayî, lê xelik bi xwe ji vê rastiyê tê digihîjin ku eva siyaseta derekî ye ku bûye sedema baykotan.

PDK Îranê jî bi awayek micid li ser vê bawerriyê de ye ku baykot li ser şiyana rejîm bo dirêjedana siyasetên tekderane ên wê karîgerî hebûye. Serbarê wê jî baykot bi tenê nikarin bibne sebebê guherînkariyan li çawaniya riftarên rejîmê li pêwendî li gel pirogramên navikî de, yan bibe sedema piştewanî nekirina wê ji rêxistinên terorîstî li deverê de.

**3:** Baldan û pêdagiriya welatên rojavayî li ser çeka navikî lojîkî û hêjayî têgihîştinê ye. Nîgeraniyên micid hene ku hewcehiyên eqlanî li pêwendî li gel jinavçûna dualî li ber bi rûbûna navikî ji aliyê rejîma mesebî a Îranê ve girîngî pê nahê dayîn û her li vê demê de nabe gefên rejîmek weha li dor welatê Îsraîlê weha bi hêsanî bê piştguh xistin. Ji bilî wan gef û metirsiyan,



Îraneke navikî dikare bi rêxweşker û hayderê rikeberiyan li warê xwe pirçek kirinê li deverê de, ku her niha jî em şahidê vê yekê ne ku welatên weke Erebistana Seûdî,

Turkiye û Misir li ser hêla bûn bi welatek navikî de gavan davêjin. Her bi vê radeyê jî nîgeranî ji vê senaryoyê heye ku rejîma teyar bi çeka navikî li Tehranê de bi armanca xurtkirina hejmûniya xwe li deverê de bi awayek eşkeretir ji berê piştewaniya xwe ji terorîzma navnetewî xurt bike û bibe sedema neewlehiya zêdetir li rojhilata navîn de. Tekez li ser çeka navikî bi bê baldan bi tawanên rejîmê li warê mafên mirov û mafên jinan ve, her li wê demê de, dibe sedema wê ku Îranî wusan bifikirin ku em girîngiyê bi wan nadin.

**4:** Em li ser vê baweriyê ne ku li cihê hewildan bo guherandina siyaset û reftarên rejîmê, dema wê hatiye ku hizir ji çawaniya guherandina rejîmê bikin. Her li vê pêxemê de riya herî bibandor piştewanî ji bihêztir kirina opozîsyona demokratîk li Îranê de ye. Gef bi êrîşa leşkirî bo ser nawendên navikî ên Îranê ji ber wê ku nabe sedema guherîna rejîmê, mifahek tunabe.

Ger êrîşên weha bên kirin û rejîm dîsan li ser desthilatê de bimîne, wê tund û tûjiya li dijî xelkê zêdetir bike. Her çawan be dibe li ser vê babetê tekez bê kirin ku li egera êrîşên li ser Îranê em li ser vê baweriyê ne ku xelik piştewaniyê ji rejîmê nake. Ger opozîsyon ji aliyê civaka navnetewî ve piştewanî û bihêz bê kirin, hêvî û baweriyek zaf li dilê xelkê Îranê de dê vejît û bi awayek berfirehtir dê piştewaniyê ji opozîsyonê bikin.
Bo nimûne, nûnerên perlemanê dikarîn bi gazîkirina opozîsyonê li ser pirsa çawaniya pêkanîna yekêtiya zêdetir li ser armancên hevbeş guhertina bîr û hizran bike.

Bi piştewanî û hevkarî krina opozîsyona demokrat atmosfer û fezayek vekirîtir, guncaw û jêhattir ji bo piroseya demokrasiyê pêk tê. Birêz Fabiyan li ser helwesta PDK Îranê derheq dijberî li gel desttêwerdana leşkirî a rojava li pêxem hiloşandina rejîma Îranê tekez dike.

Ger li çalakiyên girûpên opozîsyonê piştewanî bê kirin, çalakiyên wan kesên ku li navxweyî Îranê de li dû guhertinên aştîxwazane de ne, berdewamiya zêdetir dibe û eva jî xaleke ku Fabiyan tekez û pêdagiriyê li ser dike.

Birêz Fabiyan dibêje li rojên dahatî de helwesta hikûmeta Îranê li hember tîma lêveger ên NY belgeyek bawerpêkirî dibe daku em bizanibin ku gelo rûrastiyek li derbirîna rejîma Îranê de heye yan li bingeh de li pey têkdana her çiqas zêdetir a balansa hêzê li deverê de ye.

## Dîplomatek Îranî li Birizîlê bi tawana azara cinsî a zarokan hat girtin

Polîsê Birizîlê roja çarşemî ragihand ku du mêr ku yek ji wan dîplomatek Îranî ye li dema azardana cinsî a du kiçên temen 7 salî û 15 salî de li yek ji avjengehên wî bajarî de destbiser kirin. Ji ber ku li dema avjeniyê de azara zarokan dane û wan du keçan nerazîbûna xwe nîşan daye û doz li dijî wan vekirine.

Li gor malpeta Elarabiya navê wî dîplomatî, Hişmetula Xerbanî, ê 50 salî ye ku yek ji şêvirmendên yasayî ên balyozxaneya Îranê li Birizîlê ye.

## Hejmarek ji qutabxaneyên Bokanê ji ber xirabiya rewşa ewlehiyê hatin daxistin

Qutabxaneyên seretayî, nawendî û paşnawendî ên bajarê Bokanê li dor nerazîbûna bi çendîn haletên zarok dizînê hatin daxistin.

Pêka çavkaniyan li wan çend rojên derbasbûyî de 10 haletên zarok dizînê li Bokanê de hatine tomar kirin. Gurûpek çekdar niha li Bokanê de derketiye ku zarokan didizin û piştî destdirêjiya cinsî li ser wan, wan dikujin û piraniya şevan jî, gefan ji hevwelatiyan dixwen.
Hevwelatiyên Bokanê nîgeranê xemsariya berpirsên hikûmetê ne û nerazîbûna xwe eşkere kirine.

# Zivistan bidawî dibe û rûreşî tenê ji rejûyê re dimîne!



Dara Natiq



**T**erorîzim yek ji wan diyardeyane ku rejîma mirovkuje Komara Îslamî baweriyek kûr pê heye û weke mikanîzm û stratîjîya herî baş bo serkutkirina neyarên xwe û parastina nizam û berdewam hiştina di deshilata reş û biyome xwe mifahê jê distîne.

Ji şoreşa sala 1357'an virde, terorîzim beşek neveqetiyayî û sîstimatîk ji siyasetên Komara Îslamî bûye. Karbidestên payebilind ên vê rejîmê bi giştî li ser vê baweriyê ne ku kuştin, rehîn, bombe danîn û teqandin bona gihîştin bi armancên siyasî ên rejîmê li ser asta navxweyî û derweyî de alavên yasayî ne û seba vê yekê Îran rejîmek terorîstî ye.

Xumeynî di helwestek nemirovane da û dûr ji her yasa û rêsayek navnetewî û pirensîbên exlaqî, fermana qedexekirina rojname û rêxistinên siyasî pejirand û herweha biryara cîhadê li dijî gelê kurd û kuştin û serkuta azadîxwazên welat ragehand. Piştî derçûna vê biryarê heya niha jî, tarîperestên rejîma Îranê di heyamê zêdetir ji sê dehsal ji deshilatdariya xwe de bi piraktîzekirina hizra terorîstî ya xwe, bi sedan kes ji azadîxwazên welatê me bi taybetî rêberên payebilind ên PDK Îranê bi awayên curbicur li ser maseya aştî û diyalogê li derve û navxwe de teror kirine.

Rejîma Komara Îslamî bi taybetî hizir dikir ku bi terora Dr. Qasimlo, tevgera azadîxwaziya kurd li rojhilatê Kurdistanê vê biçokde bê yan jî aliyê kêm dê hevrîşê bêhêvîtî û lawaziyê be, lê qutabiyê mekteba demokrat, Dr. Sadiq Şerefkendî wek kesatiyekî şoreşvan, naskirî û netewe perest û girîngtir ji wan, akadimîst, dîplomat û şareza alaya xebatê her bilind ragirt; ku ew jî bû sedem rejîm hest bi metirsiyak mezin bike, çûnkî eva beravajî daxwaziya Komara terorê bû. Lewma car din rêberê azadîxwaze gelê me bûye armanca terorîstî ye rejîmê.

Lewre her zû hovên Cemaranê û ew çekçekûleyên ku ji tirsa ronahiyê xwe xişandibûne nava şikevtên tarî û bîr û hizrên çaxên kevnar, taba dengê dilêr û kesatiyê biheybet û rêberê xebatkar û şoreşgêrê gelê me, Dr. Sadiq Şerefkendî nekirin û di 26'ê Xermanana sala 1371 a Rojî de, taqimek ji xwînrêjên xwe û qirêjxwerên Hizbulahê şandin Berlînê û di Restorana Mîkonosê di dema birêveçûna civîna hêzên Îranî de, rêberê mezin yê gelê me şehîd kirin.

Terorek ku beravajî terorên din ên rejîmê, pêlek berfireh ji hevxemî û hevsoziyê pêk anî, wate di piroseya rojevkirina dosyeya terorê û dadgehî kirinê de, opozîsyona Îranî û dilsozên Îranî û biyanî bi tewahî hevkariya dozgeriyê kirin. Lewma bi hevkariya tev aliyan û serbarê hewlên zaf ên Komara Îslamî bo rêgirtin ji birêveçûna wê dadgehê, liqa serbixwe ya Dozgeriya Bilind a Berlînê, di dadgehek serbixwe û dadperwerane de ku heya 5 salan domand, û piştî guhdana bi îfadeyên pitir ji 180 kesan û nirxandina bi hezaran belge û dukomêntan, roja 21'ê Xakelêweya 1376'a rojî di biryareke dîrokî de, karbidestên payebilind ên Komara Îslamî bi pilandarêj û birêveberên terorê mehkûm kir û Wezareta Îtilaatê bi tawanbar û hevpar di terorê de dan nasandin, herweha hukmê destbiser kirina Elî Felahiyan, Wezîrê Îtilaata wê demê ye Îranê ragehand.

Encama vê dozgeriyê eve selimand ku teror beşek sereke ji kakil pêkhateya deshilatdarî û otorîteya xwesepandî ya Komara Îslamî ya Îranê ye, herweha di deqa hukmê de bas ji sîstema cînayetkar û terorîstiya rejîmê tê kirin ku çawa û bi çi awayekê pîlana jinavbirina tev neyarên xwe derêtiye û di pêxema wê de jî, ji her alavek terorîstî mifahê distîne.

Hukmê Dozgeriya Mîkonosê bû bi nuqte guhertinek girîng bo lêkolîn ji karbidestên Komara Îslamî ku êdî nekarin pitir dirêjiyê bi karên xwe ên terorîstî di asta navnetewî de bidin. Biryarek ku bû sedema riswa bûna zêderit ya rejîmê li raya giştî de û rûçikê terorîstî yê Komara Îslamî bi cîhanê da nasandin û gelek ji welatên cîhanê bi nîşana mehkûmkirina wê terorê, balyozê xwe ji Tehranê vekişandin û piraniya welatên cîhanê, kesatî û rexistinên mirovdost, Komara Îslamî weke encamderê terora han mehkûm kirin.

Biryara Dozgeriya Mîkonosê rastiyek haşa hilnegire ji cînayet û tawanên Komara Îslamî ku nemaze karbidestên rejîmê jî nekarîn haşa ji wê kiryara qirêj bikin û li dawîn gotinên yek ji karbidestên rejîmê bi navê Ebas Selîmî Nimîn ku bas ji rola Refsencanî di terora Restorana Mîkonosê û herweha teqîna binkeya leşkirî a Amerîkayê li Erebistan û... hwd dike û gefa vê yekê dixwe ku hekî Haşimî bêdeng nebe, gelek ji wan teror û cînayetên ku di serdemê serkkomariya wî û li ser biryara wî û ji aliyê Wezîrê Îtilaata Îranê (Elî Felahiyan) ve hatin encamdan, vê eşkere bike. Rastiyek ku piştî midehekê Refsencanî îtiraf pê kir û ragehand ku kiryara han ji aliyê kesên xweser di nav rejîmê de hatiye encamdan. Wate navbirî dixwaze bi wan axaftinan bi awayek bêşermane, haydar nebûna xwe di wê terorê de nîşan bide!. Cînayetên ku piştî înkarkirina dehan salî ji aliyê biker û berpirsiyarên rejîmê ve, niha îtrafê li ser dikin û wekî kurd dibêjin Zivistan bi hemû sirr û seqema xwe derbas dibe û rûreşî tenê ji rejûyê re dimîne.

# Se bo kê direvin?



Kêyhan Yûsifî

**D**i vê cîhana ku em têde dijîn û di vê riya pirr ji çep û xwar a dîrokê de gellek kes hatine û çûne, û her yek ji wan bi qasî şiyan û têgihîştin ji peyam û resaleta hebûna xwe toyek çandiye.

Hinek kesan nasname û esliyet û koka mirovî a xwe nasîne û riya pirr îza ya dîtina rastiyan û azadjiyanê girtine pêş, û bi can û dil êş û elemên jiyanê qebûl kirine û ketine ber xezeb, kerb û kîn û zora xwedî deshilatan, û ên weha jî hebûne ku wijdana xwe binpê kirine û bûne xizmetkar û guh li fermanê xwedî deshilatan.

Dîroka mirovahiyê berdewam gewahyarê şerê di navbera wan du desteyan de bûye. Yên ku dilê wan bi neteweya wan re bûye û di nav dilê neteweya xwe de rabûne û alaya azadîxwaziyê bilind kirine, û ên ku çavê wan kor, û guhê wan kerr, û bûna koleyê mal û deshilatê.

Di Kurdistanê de jî hebûne ew xwefiroşên ku nîrê bênasnameyiyê avêtne stûyê xwe, û riya xizmetkirina bi êrîşkarên vê nîştimanê û îxanetkirina bi xak û neteweya xwe hilbijartine, herçend ku piraniya wan xwefiroşan ne bi zanebûn, ketine dava îxanetê de, lê kirêgirtî û pênûsfiroşên weha jî hebûne ku bi zanebûn, av rijandine nav coka êrîşkaran û hakimên zalim de, û dijî xortên vî neteweyî li refa dijminên nîştiman de dest bi şer kirine.

Yek ji wan kesên xelk jê bêzar, di vê qonaxê de tu kes nine ji bilî "lêkoler"ek jixwerazî bi navê Îrfan Qaniî Ferd.

Qaniî Ferd çend rojan berî niha mêhvanê programa "Hemsedayî" (Hevdengî), a kanalaFarsî ziman, ya "Endîşe" bi pêşkêşkariya "Feramerz Firûzendê" bû. Di vê programa pilankirî de, û bi ducarîkirina axavtinên ne rast û baskirina ji gotinên bê bingeh û ne mentiqî, di hewla rexnegirtina ji dîroka xebata neteweya Kurd û rohnkirinan derbarê tevgera Kurd, û kesayetiyên hezkirî û buhagiraniyên netewî ên vî neteweyî bûn. Lê rexnekirina dîrokê û vedîtina rastiyan erkek giran e, ku rêrewa dîrokê her kesî di vî warî de hêja nabîne, û li gorî gotina Îdwar Seîd ya ku derbarê rolê lêgerekî rastiyan giring e, serbixweyî û armanca wî/ê ye.


Serbixweyiya lêger û lêkolerê rastiyan û girêdayînebûna wî/ê bi nawendên deshilatê ( ku wan nawendên deshilatê tu armancek ji bilî jinavbirina neyarên xwe, û dapûşîn û veşartina kar û kiryarên xwe bisedma "meslihet" yan "şanaziya netewî" tuninin), û her weha baskirina ji du armanên esîl wate "Azadî" û "dadperwerî" ku pêwera nirxandina tewaya kar û kiryarên deshilatê ne, bingeh û koka lêkoler û lêgerê rastiyan dide selimandin.

Lêgerê li pey rastiyan berdewam rexneyan ji kêmasiyên heyî digre,ku pêkînerê wan kêmasiyan jî her hikumet bixwe ye. Lê gelo mirov dikare Qaniî Ferd jî bîne nav refa wan mirovên ku ji bo destnîşankirina rastiyan karê lêkolîn û lêgerînê dikin?

Gelo Qaniî Ferde deshilat û kar û kiryarên wê rexne dike, gelo armanca Qaniî Ferd dadperwerî û azadî û berevanî ji mafê binpêpikrî ê neteweya wî ye? Qaniî Ferd di warê kîjan siyasetê, li gorî xwe lêkolînan dike û rexneyan digre?

Qaniî Ferd darê heracê li dîroka azadîxwazane û mafê neteweyek belengaz dide, û xebata neteweya Kurd girêdayî bi aliyên derekî dide zanîn, rast ew axavtinên ku erbabên wî li Cemaranê zêdetir ji sê dehsal e ku dikne carr, ku di rastî de neteweya Kurd ji wan gotin û boxtanên bê bingeh têr bûye. **Dom li R: 6**

www.arsivakurdi.org




# Bandora dorpêçên aborî û dijwarbûna jiyana xelkê



**Azad Kurdî**

Dema hikûmetek siyasetên radîkal li dijî tenahiya civaka navdewletî dimeşîne û berevajî pîvan û peymanên navneteweyî tevdigere, hêzên mezin ên cîhanê neçar dimînin reaksyonan nîşan bidin. Çaxê liv û tevger ji bo razîkirina wan hikûmetan bi rêya diyalog û dîplomasiyê ne mimkun dibe, hêzên mezin dest didin rêvebirina dorpêçên aborî û siyasî li dijî wan desthilatan. Nimûneyên wiha di cîhanê de li 30 salên borî pirr in, wek Kureya Bakur, Lîbya, Iraqa berê û Komara Îslamî ya Îranê, Sûriye û hwd ...

Di vê rewşê de çendîn diyardeyên civakî û aborî serî hildidin ku berpirsyarê rewşa han rayedaranên wan welatan in di serî de û zeremend û goriyên serekî jî xelk e. Rewşa niha ya Îranê vê yekê dide xuyakirin. Hikûmetên ku rûbirûyê vê rewşê dibin, bêhtir sîstemên totalîter û fendemental in ku ji ber îdeolojiya xwe xelkê dikin gorî û li dijî berjewendiyên wan tevdigerin heya wan sûd û berjewendiyan biparêzin.

Dema ku civaka navdewletî derbarê çalakî û tevgerên Komara Îslamî ya Îranê derbarê bernama etomî ya vê hikûmetê bêhêvî bûn û ti encamek erênî ji gotûbêj û dîplomasiya demdirêj wernegirtin, hewlên meşandina dorpêçên aborî û siyasî li dijî vê hikûmetê hatin destpêkirin.

Di destpêkê de rayedarên Komara Îslamî îdea kirin ku dorpêç çiqas jî berfireh bin, nikarin bandorê bikin ser aboriya welat û jiyana hevwelatiyan. Lê dema dorpêçên aborî li ser pîşesaziya petrol, petroşîmî, gaz û bankên sereke yên Îranê xurt bûn û tevgerên bazirganî yên fîrmayên mezin ên cîhanê kêm bûn, êdî wê demê rayedarên Komara Îslamî li xwe hesiyan.

Tenê ji destpêka sala 2011'an heta niha ku dorpêçên aborî li ser Îranê berfireh bûne, diyardeyên civakî û pirsgirêkên aborî yên xelkê du qat zêde bûne. Buhayê alev û xwarin û vexwarin her diçe zêde dibe, bêkarî berfirehtir bûye û pirraniya kedkaran karên xwe ji dest dane yan çend meh in miaş û heqdestê xwe nestandine. Dehan karxane û kargehên mezin ên hilberînê hatine girêdan û rastî kirîz û têkçûnê hatine, hilberîna gaz û petrola Îranê pirr kêm bûye û niha rayedar jî îfadeyê bi bandora dorpêçên berfireh ên civaka navdewletî li ser aboriya welat dikin. Komara Îslamî vê mehê ragehand ku pileya enflasyona aborî giha 21.5 ji sedî, lê çavkaniyên ne fermî vê hejmarê du qat zêdetir radigehînin û li herêmên mîna Kurdistanê ku bêkarî û xizanî bêhtir heye, rêjeya han digihe ji sedî 40'ê jî.

Di rewşên wiha de xelk zêde diêşe û zerarê dibîne. Er diçe diyardeyên civakî bêhtir dibin û pirsgirêkên aborî jiyana xelkê rastî astengên mezin kirine. Dabînkirina debara jiyana rojane pirr dijwar bûye, buhayê xwarin û vexwarinê heta qasekê zêde bûye û dibe ku hêza kirîna xelkê gellek jêrde hatiye. Di vê navberê de xelkê hejar û kêmdahat, bi taybet kedkar û zehmetkêş pirr jiyanek nexweş diqedînin. Zarokên dibistanê jî niha bo debara jiyanê ketine tevgeran û li her sûk û bazaran zarok tên dîtin ku ji bo qedandina jiyana rojane ya jiyana malbatên xwe kar dikin.

Di rewşa niha de çîn û qatên xizan û hejar ên civaka Îranê, bi taybet herêmên derdpora Îranê ku netewe têde dijîn, bêhtir ketine tengasiyan. Ji ber ku berê jî jiyan bo wan dijwar diqediya û navçeyên Kurd, Belûç, Ereb û Turkmenên niştecih li Îranê di bin siyaseta dorpêçên aborî û senetî ji aliyê hikûmeta Komara Îslamî ve rûbirû bûn. Niha barê giran ê du dorpêçan dikşînin û jiyan ji xelkê tehl û nexweş bûye. Li gor standardên cîhanî yên jiyanê dema hevwelatî ji bo dabînkirina alev û pêdiviyên sereke yên jiyanê bikevin nav tengasî û zehmetiyan, ew jiyanek nexweş û hejarane derbas dikin.

Lê tecrubeyên welatên ku xelkê xwe rastî çarenûsek wisa kirine û rûbirûyê civaka navdewletî dibin, rewşa niha ku li Îranê dom dike heta serî wiha nameşe û xelkê bêzar û nerazî di bin barê giran ê debara jiyanê dê bêdengiyê bişkînin û rê nadin jiyana wan jî bibe goriyê îdeolojî û tevgerên dîktatorane yên rayedaran bibe û heta vê qasê jî jiyanek reş û nexwşe derbas bikin.

# Niqurçk

## Fîrozabadî bêt? Ger derazînkê jêk nebe der, bila bêt!!!



**Ceifer Mubeşirniya**

Fîrozabadî Serokê Sitada Giştî a Hêzên Çekdare rejîma Îranê gefek li "ser hewayê zikê xwe" xwar û got:"Di egera her êrîşekê de emê Îsraîlê bikêlin".

Kêlana ku tu dibêjîî û mebest ser û bin kirina Îsraîlê be, "na", hûn nikarin bikêlin, çimku cihê ku hûn dibêjinê dujmin, bi rastî mîna beyarek çiyayên bilind ji destên werzêrên bêinsaf dûr e û her yê mîna xwe bipît û bereket bimînin.

Tu bo nabêjî ew cihên ku hûn dibêjnê can û dil, axa pîroz, erdê xwedê, cihên ku hûn rondikên tîmsahî bo dirêjin, weke Felestîn, Lubnan, Başûrê Îraqê, Sûrıye!!! Ohooo, weke Îranêêê!!! Zikçêlê bagirdan, hey qedela rûni ma we ew baş kêlane? Ka mêze bike mirov ji wan deran de dijîn? Bizane jiyan, evîn, rehm, xweşî, perwerde û aqil û zanist di wan cihan de kêlayîne yan ne? Ger wa nebe "xwedê xenîmetiyê riha min bibe û ez xêrê ji xwe nebînim".

Lêêêêê.., ez bawer nakim ku Fîrozabadiyê ziktojen ji wan tiştan fikirîbe. Wusa dixuye ku axaftina wî heq be û dikare Îsraîlê bikêle!!!, Vêca tu bo nakêlî!! Sukir û şepîlkên ku te heyî, ez û xwedê he "nîr û cot" jê kêm in û xerezanekê jî bila celladên te ên ku di şeqamên Tehranê de ji teşk û demanên keçên ciwan dixistin, bigrne destê xwe û her ji banîkên "Colan"ê ku çavên we pê



sor bûne ve bigre heya digîje navenda "Têlavîv"ê bikêle, kes nizane ku tu mirovî, xelik wê bêje: Hehey kelê min!!!

## Xweşdil bêt? Nas nakim lê bixêr bêt

Simayîl Xweşdil, Nûnerê Civaka Masîgir û Werzêrên Hurmizganê di axaftinekê de got: Ehmedînihaj "Ya Elî"yekê bêje û pirsgirêka abûrî a masîgir û werzêrên Hurmizganê çareser bike!! Wexte em ji birsan bimrin.

Nebêje mebesta wî ev e ku Ehemdînijad ji wan re deske şene û singan hilû bike!!!, ne arîşeyên abûrî ji wan re çareser bike. Çimku di dawiya axaftina xwe de got: Ger "dujmin" êrîşî Îranê bike, masîgir bi benikên xwe û werzêr bi deske pêmere û şeneyên xwe dê wan bikin xoreka kûse û masiyên behra Kendawê.

Rejîma Îranê li hember her gotinek serserî û sozek derew, kiryarekê ji xelkê dixwaze, lê vêcarê dixwaze bi benik û werîs û deske şene û pêmereyan, werzêr û masîgirên Hurmizganê bişîne pêşiya "F.16" "B.52" û nizanim ecayîbên nîzamî ên Îsraîl û Amerîkayê!!!!

Neke Simayîlê mino neke! ez bextê teme tu neke. Me ew roj dîtiye û me "herkiyan" ezmûna sala 1921'an heye, dema ku Ûris "Rûsî"an êrîşî Îranê kirin û li gundê "Dolepêsan" û "Kişpile" hin xweşmêran bi şene û bêrikan, tevr û dasan, û rêzîn û bereqaniyan êrîşî tankên Rûsî kirin, dema ku tank dora xwe zivirî, gotin lêden me gêj kir ha, lê dema ku topek ji gewriya pişta gundê "Kişpile" da, xweşmêrên me reviyan û bi zarzimana herkiyanî gotin: Bihelên kurbiserno! eve ew nîne yê em dibêjin" !!!!





Agirî 5

Hejmar 181, 19'ê Nîsana 2012



# Hilkêş - dakêşa pêwendiyên navbera Tehran – Washington (I)



Ebdulla Hicab

Roja 7ê Nîsana 1980 (18 ê Xakelêweya 1359) Dewletên Yekbûyiye Amerîka (DYA) bi awayek fermî hemû têkiliyên xwe yên dîpolmatîk bi Îranê re qut kirin. Beriya wê demê, Roja yekşem 04.11.1979 (13.08.1358) xwendekarên bi rêkxistinkirî di rêza Pasdarên girêdayî bi Rêbaza Xumeynî ve ji bo nîşandana dijberiya xwe bi siyaseta Amerîka li hember Îranê, bi taybet li dijî êvirandina Şahê Îranê, êrîşî ser Balyozxaneya Amerîka li Tehranê kirin û hemû dîplomatên Amerîkaiye di balyozxanê de êxsîr kirin. Bûyerê bi xwe re qeyranek dûr û dirêje dîplomatîk anî pêş ku di qonaxa destpêka wê qeyranê de 52 xebatkarên sefareta Amerîka li Tehranê 444 rojan di benda Îranê de man.

32 sal bi ser wê demê û wê bûyera derveyî urf u edetên dîplomatîk re derbas dibin, lê şûnwarê wê hê weke xwe mane. Bi vê bûyerê re pêvajoyek pir ji alozî li pêwendiyên di navbera her du welatan de destpê kir ku niha jî çi nîşane nînin ku ew birîn bicebire. Piştî 32 salan hê niha jî ji Tehranê dengê kîn û nefret li hember Amerîkayê bilind dibe û Washington bi xewn u xeyala çal kirina rêjîma Komara Îslamî rojan dihejmêre. Lê ne duruşmên tund û tîje Komara Îslamî heya îro karîne Amerîkayê li ber çavên xelkê Îranê reş bike, ne dorpêç û givaşên karbidestên Washingtonê Îran bi yekcarî ji rojeva siyasî, abûrî û bazirganiya Amerîka avêtiye.

Ji wê demê ve ku Tehranê piştî şerê cîhaniye duyemîn deriyên siyaseta xwe ya nû bi yekcarî bi ser Washingtonê de vekir û Amerîka kire şirîkê xwe yê herî nêzîk heya niha, pêwendiyên di navbera du welatan de bi gelek qonaxan re derbas bûye. Wan pêwendiyan bi alîkariya leşkerî u abûriye DYA bo Îranê destpê kir, gîhan qonaxa hevpeymaniyê û di dawiyê de jî bi guherîna rêjîma Îranê re li dijminatiyê qelibîn. Lê ew pêvajo hê bi dawî nebûye ûhilkêş-dakêşa li siyaseta her du welatan hê berdewam dike. Pirsa sereke ew e ka gelo mijarên serkeye ciyê nakokiyê di navbera her du welatan de çi ne û ew rewş wê heya kengê her bi wî awayî berdewam bike. Lê berî ku ev bas vebe û bersiva wê pirsê bê dan, awirek serpêkî ji bo dîroka pêwendiyên siyasiye navbera du welatan pêwîste heya arîşeyên niha hinek pitir bê fam kirin.

Şerê cîhaniye duyê û pêşketinên siyasiye ku piştî şer li Îranê çê bûn, ciyê her 2 hêzên serekeye xwedî bandor li Îranê, Rûsiya an Yêkitiya Sovyet û Birîtaniya Mezin hêdî hêdî lêj kir û sînor ji bandora wan re danî. Bi wê sînûrdanînê re, wê carê deriyê Îranê bi ser DYA de vebû ku piştî şer weke hêza nû ya xwedî bandor kete Rojhilata Navîn. Di rewşekê de ku Amerîkayê hêvî dikir hem pîşesaziya nefta Îranê bixe destê xwe û hem berayîka pêşveçûna Dêwê Komonîst li Bakûr ber bi başûr û herêma stratêjîke Rojhilata Navîn bigre, Muhemmed Musediq bû serokwezîrê Îranê. Musediq bi siyaseta xwe ya çepgir û di serî de siyaseta dijî Birîtaniya di demek kin de dilê Amerîkaiyan ji xwe êşand. Dema wî li roja 29ê Reşemeya sala 1329 (30 Adara 1951) pîşesaziya nefta îranê kire neteweyî û xiste bin kontrola yekcarekiye dewletê, Amerîka dudil bû ku neke ew siyaset bibe destpêka pêvajoya ber bi sosiyalîzmê ve birina Îranê.

Eisenhower, serokkomarê demêye Amerîkayê piştgiriya sedî sed da pilanek Ingilîsiyan li dijî deselata Musediq. Pilana kûdetaya li dijî Musediq roja 28ê Gelawêja sala 1332 (18ê Tebaxa 1953) bi ser ket û wê carê Şahê Îranê bi piştgiriya DYA zivirî ser text û bi yekcarî xwe sparte Amerîkayê. Şah weke sipasiya piştgiriya Amerîkayê kontrola boriyên nefta Îranê, pilanên modêrnîze kirina welat û avakirina artêşa modern da dest Washingtonê. Ji wê demê ve Îran bû yek ji hevpeymanê here nêzîk û ciyê baweriye Amerikayê. Lê parsenga wê hevpeymaniyê ne bi awayekê bû ku her du welatan bike du dost an hevkarên xwedî bandora weke hev. Di rastiyê de karîgeriya Îranê li ser siyaseta Amerîka 0, û ya Amerîka li ser siyaseta Îranê 100 bû.

Wê rewşê derfetek zêrîn da du tevgerên siyasiye dijberî rêjîma Şah. Tevgera çep bi pêşengiya Hizba Tûdeh ku sedased di xeta Sovyetê de bû û bê îradeya serbixwe siyaseta Moskvayê dişopand, û tevgera olî ku bi pêşengiya Xumeynî ber bi hindê ve diçû xwe bi rêkxistin bike. Partiya Tûdeh kir û nekir nekarî siyaseta xwe ji asta pêşengên civakê u rewşenbîran derbasî nava civakê bike û bibe partiyek gelerî ya ciyê baweriyê. Lê Xumeynî karî kûditaya sala 1953 û girêdana Şah bi siyaseta Amerîka re bike bingeh ji bo vegeşandina tevgerek seranserî ya dijber bi rêjîma Şah re. Xumeynî sala 1963 bi awayek cidî dengê dijberiya bi rêjîma Şah u pêwendiyên rêjîmê bi Amerîkayê re bilind kir.

Sawaka Şah pêştir Xumeynî derwelatî Turkiyê kir û pişt re ew şande Îraqê. Xumeyî ew pêgav jî bi siyaseta Amerîka ve girêdayî dît û hê zêdetir dengê dijberiya bi Amerîkayê re bilind kir. Bi şêweyekê dijberiya navbera Xumeynî û DYA zivirî kîna taybete Xumeynî li hember piştgirê serekeye dijminê wî ku rêjîma Şah bû.

Sala 1979 dema Xumeynî li Îranê deselat girte destê xwe, ev derfet kete destên wî ku hêza xwe nîşanî Amerîka bide û bi her awayê ku dikare toleya xwe bistîne. Di wê rewşê de Şahê Îranê ku li ber bayê şoreşa 1979'ê revî bû, xwe avête bin sîvana Amerîkayê. Dema ku Washîngtonê bersiva daxwaza Xumeynî û alîgirên wî ji bo paşvezivirandina Şah û darayiyên wî neda, Xumeynî ew yek jî kire hêcet ji bo wê tolhildana ku bi salan bû di hundirê xwe de perwerde dikir. Bûyera Balyozxane û girtina dîplomatan di wê çarçoveyê de hate pêş.

Dema Amerîka li sala 1980 pêwendiyên xwe bi Îranê re qut kirin, beşek ji karbidestên nû ku hin girêdayî bi Xumeynî nebûn û kîna wî li hember Amerîkayê parve nedikirin xwestin rewşê biguherin û dubare bi Amerîkayê re pêwendiyan damezirînin. Dijberiya wan bi Amerîkayê re zêde xurt nebû, lewma ew ketne hewldanê ji bo vejiyandina pêwendiyan. Lê bûyerên ku li pey qeyrana girtiyên Amerîkayî li Îranê qewimîn deriyê pêwendiyan pitir girt. Hewla rizgarkirina giretiyan û ketina balafirên Amerîkayê li nava axa Îranê di operasyona serneketiye rizgariya girtiyan de, helwêsta Amerîkayê li ser şerê Îran û Îraqê, şiltaxiyên Îranê li Lubnanê û hêrişa hevalbendên rêjîma Xumeynî bo ser serbazgehek Amerîkayî li Beyrûtê di sala 1983 de ku bû hegera kuştina 299 Amerîkayî u Feransewiyan, ji wan 241 Amerîkayî, her wisan dorpêçkirina abûriye Îranê ji aliyê Amerîkayê ve, pêwendiyên navbera her du aliyan hê aloztir kir.

Di germahiya dijberiya navbera her du aliyan de, wê demê ku hê birînên her du aliyan necebirî bûn, aşkera bû ku sala 1985'ê Amerîkayê di berdêla azadkirina hin girtiyên Amerîkayî li Lubnanê gelek çek û sîlah dane Îranê ku wê demê bi Îraqê re di nava şerek dijwar de bû û bi wî awayî gelek pêwîstî bi wan çekan hebû. Bûyer ku bi navê gendeliya ''Îran Gate'' hate bi navkirin, nebû heger ku her du welat pitir ji hev nêzîk bibin, lê tilisma pêwendiyên navbera her du aliyan şikand.

Salên 1987 û 88 dema Îranê ji ber zextên dawiye şerê bi Îraqê re di tengava Hurmuz de tengasî çê kirin û gef kir ku hêrişê bike ser gemiyên neftkêşe hevpeymanên Amerîkayê, Washington bi lez bersiv da. Di encamê de hin pevçûnên çekdariye sînordar di navbera hêzên deryaiye Amerîka li Kendavê û hêzên Îranê de rû dan. Amerîkayê pilatformek neftê ya Îranê teqand u tevgera serbaziye Îranê li Kendavê pir bi sînor kir. Di rewşek wisan aloz de, roja 3ê heyva 7 ya sala 1988 Gemiya şer a Amerîkayê "Vincennes" balafirek rêvînghilgire Îranê li Kendavê berda xwarê u bi wê re bûyerê re 290 rêviyên di balafirê de kuşt. Bi wan bûyeran re hewldanên alîgirên damezirandina pêwendiyên bi Amerîkayê re dubare bê encam man u ew neçar man bi carek din bêdeng bin. Dubare pêwendiya her du aliyan ber bi aloziyê ve çû.

Mirina Xumeynî li sala 1989 derfetek nû da alîgirên damezirandina pêwendiyan bi Amerîka yê re.

www.arsivakurd.org

# Kurd divêt bi hişyarî tev bigerin



Şehab Xalidî

Konferansa dostên Sûriyê çend rojan berî niha bi bê beşdariya Kurdan, û bi beşdariya 83 welatên cîhanê li Turkiyê de birêve çû. Di vê konferansê de cuda ji vê ku Civata Nîştimaniya Sûriyê wek yek ji nûnerên fermî ên xelkê Sûriyê hate pejirandin, berpirsyarên Civata Nîştimanî a Sûriyê ragehandin ku ew dê alîkariya madî bidne wan çekdarên ku bi rejîma Beşar re şer dikin, û ew alîkarî wê wek heqdestê mehane be. Dana hiqûq bi wan leşkerên ku ji erteşa Sûriyê diveqetin jî yek ji wan xalên baskirî bû.

Herçend ku di vê konferansê de bas ji demokrasî û wekheviyê li navbera tewaya pêkhateyê Sûriyê de hate kirin, lê bas ji qebûlkirina Otonomiyê wek mafê çarenûsê ji bo Kurdan nehate kirin. Eva jî di demekê de ye, ku di konferansa dostên Sûriyê ya heyamekê berî niha di Tûnisê de ku bi beşdariya zêdetir ji 70 welatan birêve çûbû, Xelyon bas ji nasnameya Kurdan û qebûlkirina mafê wan ê neteweî jî kiribû. Lê heyamekê piştî wê, dîsan di civîna Civata Nîştimaniya Sûriyê ya li Stenbolê ku çend roj berî konferansa Stenbolê hatibû girtin de, dîsan bas ji mafê Kurdan nehatibû kirin û li encam de Kurdên beşdar civîn bi cih hêlabûn.

Lewra bangnekirina Kurdan bo konferansa Stenbolê û basnekirina ji qebûlkirina mafê Kurdan wek mafê çarenûsê di çarçoveya herêmek otonom de, û her car helwsetgirtinek ne zelal û cuda ji aliyê ENS'ê ve, ji aliyê siyasetvan û şarezayên pirsa Sûriyê ve şirove û xwendinên cuda li ser hate kirin.

Hinek ji wan şarezayan ser vê bawerê ne ku ew konferans ku konferansek fermî û pirr giring û çarenûssaz di warê diyarîkirina sîstema pêşerojê ya Sûriyeya nû de bû, divêt Kurd wek neteweyek sereke di Sûriyê de ku xwediyê xak, ziman û dîroka xwe di Sûriyê de ne, bo konferansê bihatiban bangkirin, û dîsan li ser wan helwestên ku li konferansa Tunisê de derheq Kurdan girtibûn pêdagirî kiriban, lê bangnekirna wan bo konferansek weha giring mirov dixe nava şik û gumanan de, ku vê carê jî




neyarên Kurdan ên bi bandor di van civîn û konferansan de dixwazin peymana Lozanê ducarî bikin. Lewra Kurd divêt bi hişyarî tev bigerin, kûr bifikirin û û wan pîlanan pûç û bê bandor bikin.

Hinek ji siyasetvanên Sorî herweha ser vê bawerê ne ku bangnekirina Kurdan bo vê civînê û basnekirina ji pirsa Kurd girêdayî fikir û hizra şovînîstî ya beşdarên di Civata Nîştimaniya Sûriyê de ye, ku niha jî di sedsala 21'an de bawerî bi hizra yek netewe û yek ala û yek zimanî hene, û heke ew bibin deshilatdar, wê dîsan Kurd bê maf bimîne,

Lê serbarê vê hizra şovenî, ji ber ku endamên Civata Nîştimaniya Sûriyê di vê qonaxa hestyar de hewcehî bi beşdariya tev hêz û aliyên siyasî ên Sûriyê di şoreşê de hene, û bangnekirina Kurdan ne di berjewendiya şoreşê de ye, lewra jî roja piştî konferansê cuda ji vê ku Hîlarî Kilînton bi serokê ENKS'ê re telefonî axivî û tekez li ser mafê Kurdan kir, Xelyon jî di civîna piştî bidawîhatina konferansê de pêdagirî li ser helwestên xwe ên pêşîn derheq qebûlkirina mafê Kurdan kir.

Di vê qonaxa hestyar de, li hemberî wan hemî helwestên cuda cuda, ne zelal û dij bi yek de, Kurd jî divêt bi siyastek aqilane û yekgirtinek bihêz li ser bingeha berjewediyên neteweî bi dûr ji berjewendiyên teng ên hizbî tekoşînê bikin, û ji vê hewcehiya Ereban bi hêza Kurdan bo bileztirkirina şoreşê li Sûriyê de, mifayê bistînin, û bi vî awayî pirsa Kurd ne tenê li asta herêmî belkû di asta navneteweî de jî bêxne qonaxa çareseriyê, û bi vî awayî dawiyê bi wan hemû êş û azaran bînin ku gelê Kurd di vê beşa Kurdistana li jêr deshilata hikumetên dîktator di vê herêmê bi ser de hatiye, ji ber ku Kurdên me di vê beşê de hêjayî rizgarî û azadiya yekcarî ne.




Doma gotara

# Se bo kê direvin?

Qaniî Ferd li gorî vê erkê ku bê wî hatiye sipartin, hewil dide ku kar û kiryarên cinayetkarane ên nawenda deshilatê hene, ku ew bi kirê girtine. Ew hewil dide ku bi anîna belgeyên ne di cihê xwe de, derheq terorkirina rêberên şehîd ên PDKÎ, bi taybetî şehîd Dr. Qasimlo ji aliyê rejîma axûndî a Îranê ve şik û gumanan pêk bîne.

Ew li pey rizgarkirina Îranê ji tewaya wan cînayetan e ku rejîma Îranê li Kurdistanê de encam daye. Qaniî Ferd hebûna partiyan wek sedema zindîbûna civakê dizane, û hewdem pêkhatina partiyên Kurd wek karê bîhaniyan dihesibîne, û ciwan û çalakvanên Kurd bo beşdariya siyasî han dide, lê gelo pêkhatina partiyan û çalakiya di wan partiyan de bi wateya beşdariya siyasî nine? Gelo rejîma Îranê îzna çalakî û beşdariya siyasî li derveyî çarçoveya diyarîkirî û kontirolkirî a xwe dide tu kesî? Qaiî Ferd gulleberdana bi ser leşkerên Îranî wek karek kirêt û xirap bi nav dike. Gelo bidarvekirina xortên Kurd, komkujî û kuştara jin û zarok û pîr û kalên Kurdan û bi hezaran cînayetên din ên rejîma Îranê çi niha yan jî li dem û salên borî de, bo rexnekirinê nabin, ku ew lêkolerê zana! Basê lê nake?

Ew zanayê jêhatî! xwe wek alîgirê modernîte, û hizra modernîteyê dihesibîne, ew mafê diyarîkirina çarenûsa neteweyan wek kiryarek paşvemayî dizane, lê beşdarî û alîkariya di gel rejîma paşvemayî û li gorî sedsala navîn wek karek modern û îroyîn dihesibîne.!

Erkek din ya ku bi navbirî hatiye sipartin, çandina toyê nifret û nakokiyan li navbera hêz û partiyên Kurdî li beşaên curbicur ên Kurdistanê de ye.

Gotinên devikî, bê belge û direv, derheq hebûna nakokiyan di navbera şehîd Qazî Mihemed û rehmetî Mela Mistefa Barzanî li Komara Kurdistanê de, û girêdayîbûna hêz û aliyên Kurdî bi sirwîsên Îtilaatî ên welatên derekî, ew gotinên nû ninin, ku Îrfan Qaniî Ferd îro wek Tûtiyan ducarî dike. Axavtinên weha di rastî de mîkanîzma



hikumetên dagîrkar li Kurdistanê de di warê tepeseriya bêrehmane a tevgerên azadîxwazane ên neteweya Kurd di doma wan çend salan de bûye. Wan di cihê bersivdana bi xwastek û daxwaziyên rewa ên Kurdan bi wan mîkanîzman dest bi tepeseriya wan tevgeran kirine.

Ew kiryarên weha ên Qaniî Ferd, min dixe bîra çîrokek bi navûdeng : "Dibêjin ku rojekê seyek li pey girtina kêrûşkekê de bû, lê nedikarî wê bigre, kêrûşk vegeriya û gote se: xwe mandî neke, tu nikarî min bigrî. Jiber ku tu ji bo ên din direvî, lê ez ji bo xwe".

Û cenabê Qaniî Ferd tu ji bo ên din ... lê em ji bo xwe.

## Pêşnimêjê Qumê, rexne ji deshilata Îranê girt

**Pêşnimêjê bajarê Qumê, Seyîd Mihemed Seîdî, di axaftina xwe ya roja Înê de rexne ji deshilata Komara Îslamî girt û got; beşek ji giraniya di welatê me de, vedigere ser helawsana (teweroma) cîhanî, lê beşa din vedigere ser birêvebirina xirap a dewletê.**

Ew gotinên navbirî di demekê de ne, ku ji aliyekê ve hinek ji karbidestên Komara Îslamê rewşa aloz û xirap a abûrî û giraniya di welat de înkar dikin, û ji aliyê din ve kesên weke pêşnimêjê bajarê Qumê rast dewletê wek sebebkarê giraniya di welat de dizane.

## 20 Milyon Dolar xelat bo eşkere kirina binpêkirina mafê mirov di Amerîka û Berîtanyayê de!

**Serbarê vê ku pitir ji 40 çalakên jin di warê mafê mirovan de û gelek cudabîrên din, di girtîgehên rejîma Îranê de ne, Komîsyona Parlementoya rejîmê biryara terxan kirina 20 Milyon Dolarî weke xelat ji bo eşkere kirina binpê kirina mafê mirovan di Amerîka û Berîtanyayê de pejirand.**

Fatimê Aliy Endama Firaksiyona heşt kesî a jinan di parlementoyê de got ku gelaleya han di destpêka parlemêntoya heşt , di Komisyona Ewlehiya Netewî de hat ber bas, lê dewletê di civîna heyeta Wezîran di meha derbasbûyî de biryara han pejirand.

## Hinek ji welatên Erebî Erebsatê baykot dikin

**Li gorî zanyariyan hijmerek ji welatên Erebî bi birêveberên Ereb sate ragehandine ku heke bêt û pêşiya weşana Erebsat nehê girtin, ewê baykotê bixin ser vê mahwareyê.**

Malpera "Mîdil Îst online" ji zarê berpirsyarê dezgeha ragehandinê a Behrînê ve ragehand ku kanala "Elalem" ji bilî bilavkirina vir û direvan tu tiştek din bilav nake.

Elalem ji aliyê hikumeta Îranê ve tê îdarekirin û karê wê tevdanîkarî di herêmê de bi qazancê rejîma Îranê ye.

## Helwesta Amerîka cihê şermezariyê ye

**Senatorê Amerîkî yê naskirî John McCain, ji hikûmeta Amerîka xwest ku çekan bide çalekvanên Sûriyê yên ku li dijî rejîma Esed şer dikin.**

John Mccain da xuyakirin ku, ji bo hilweşandina rejîma Sûriyê ev yek pêwiste.

John McCain got ku, helwesta Amerîka li himber bûyerên li Sûriyê çêdibe û xwîna tê herikandin şermezariyek e.

Di hevpeyvînekê de ligel bernama Face the Nation li televîzyona CBS, McCain vekirî got: Kesên ku li Sûriyê serhildanê dikin li hêviya desthilatdariya Amerîkaye ku çeka bide wan, hêza leşkerên azad pêwîstî li çek û arîkariyên Amerîka hene.

Wek tê zanîn heftiya borî McCain li gel hinek senatorên din li Turkiyê serdana kampên penaberên ji Sûriye hatî kir û li gor agahdariyan hevdîtine li gel berpirsên Artêşa Azad pêkanîbû. Rojevakurd

Rojev




# Rejîma Îranê ji lihevhatinek navikî çi bidest dixe?

Ji Farsî: Agirî

Patrîk Kilawson, karnasê meseleyên Rojhilata Navîn û ji birêveberên nawendek stratejîkî li dor meseleyên deverê li ser got û bêjên navikî ên Îranê analîz û şiroveyek li malpera wê nawendê de weşandiye û dibêje: Bi baldan bi dijberiyên Amerîka û Îranê li ser pirsên weke terorîzm li deverê û mafên mirov li Îranê de, Komara Îslamî a Îranê ji lihevhatinek navikî bi rojava re dê îmtiyaz û puanên aborî ên kin bidest bixe û Xamineyî jî nîgerane ku rejîma wî ji wan destkevtên biçûk, hezîne û têçûyek zaf bide.

Li gor wî, ger rejîma Îranê biryarê jî bigre ku li gera nû ya got û bêjên navikî de bi awayê micid ber bi lihevhatinê ve bimeşe, ya ku li hember de bidest dixe, tiştek gelek biçûk û kin e.

**Destkeftên aborî ên biçûk**

Gelek ji wan tehrîmên ku ji hêla Amerîka ve li ser hatine sepandin, ji derweyî pirograma navikî armancên din jî hebûne. Weke piştewaniya Îranê ji terorîzm yan binpêkirina eşkere ya mafê mirov li navxweyî Îranê de. Bo nimûne li yasaya pêwendîdar bi tehrîmên li ser banka Nawendî a Îranê ku ji hêla Obama ve li meha Şibatê de hat wajo kirin, hat gotin ku sedema wê cezayê, rola banka Nawendî û bankên din ên Îranê li veşartina dan û standinên xwe bi nawendên baykotkirî û rola wan li pûlşûyî û metirsiya wan li ser sîstema banka navnetewî re bûye, lewma tu yek ji wan bi lihevhatina li pirsa navikî re çareser nabin.

Ji hêla din ve ceribînan nîşan daye ku hikûmeta Amerîka heta eger biryarê jî bigre, tehrîm û cezayên aborî li ser welatan bi awayê qonax bi qonax û demdirêj kêm dike. Li ser Îranê jî niha gelek ji wan tehrîman bûne bi yasa, û herçend serokkomar dikare pêka berjewendî û ewlehiya netewî a Amerîkayê wan tehrîman mandel bike, lê guhertina wan yasayan li siyaseta navxweyî Amerîkayê de karek ne hêsan û gelek dijwar e.

Welatên din û bi taybetî Ewropa jî sedema wan tehrîm û cezayan, vedigerînin bo rewşa mafê mirov li Îranê de, lewma li nêrîna Ewropiyan de jî heta eger çareseriya pirsa navikî a Îranê jî bê kirin, dosyeya mafê mirov ku Îranê karnameyek xirab û reş têde heye, nahê daxistin.

Heya wî cihê ku pêwendî bi biryarname û tehrîmên Konseya Ewlekar li dijî Îranê ve heye, Amerîka wê hewil bide nehên betalkirin û dê her li cih de bihêle. Çûnkî Amerîka nîgerane ku Îran bi soz û peymanên xwe pabend û wefadar nemîne û paşan jî dîsan pesend kirina wan li konseya Ewlekar de karekî giran jêre dibe. Tenê renge bo midehekê bide sekinandin.

Lewma take puana ku Îran dikare ji lihevhatinê bigre, pêşîgirtina ji tehrîmên zêdetir e nek betalkirina tehrîman; Helbet eger lihev bên, nexa wê givaş û tehrîmên zêdetir li benda Îranê bin. Çûnkî gerra nû ya tehrîmên neftî li dijî Îranê li meha Hezîranê de dikewe kar.

**Nîgeraniyên Xamineyî**

Xamineyî, rêberê nizama Îranê hertim li ser vê eslê tekez kiriye ku lihevhatina li ser vê mijarê bi Amerîkayê re encamek wusa nabe, ji ber ku Waşîngton li bingeh de siyaseta guherandina rejîmê dişopîne û ger pirsa navikî jî çareser bibe, dê li pey hincetek din li dijî Îranê bona givaştinên zêdetir bigerin. Ew û berpirsiyarên din bi salane îdea dikin ku Amerîka ji riyên cur bi cur ve li pey herifandina rejîma Komara Îslamî ye. Nemaze xwenîşandanên piştî hilbijartina serkomariyê li sala 1388'an de bi pîlan û kumpiloya Rojava bona ''hiloşandina nerm''a rejîmê dan hesibandin.

Hewlidan ji bo razîkirina Xamineyî li vê derheqê de karekî dijwar e, ji ber ku ew ji puanên rojava zêdetir ji givaşên wan nîgeran e. Dijberiya eşkere a Xamineyî bi her terze pêwendî û lihevhatiên bi Amerîkayê re, li dîtingeha wî de gav avêtina ber bi sernişîviyek metirsîdar e. Lewma ew naxwaze lihevhatin çêbin.

**Madeyên navikî li hemberî pirograma navikî**

Renge girîngtirîn destkefta Îranê ji lihevhatina li dor kirîza navikî li biyava pirogramên navikî de be. Ew pirogram niha li piratîk de xala bihêz a Îranê ji bo her terze got û bêj û dan û standinekê ne. Bidest xistina rewatî û meşrûiyeta navnetewî ji bo parek ji vê pirogramê bo rejîma Îranê serketinek mezin dibe.

Renge Amerîka û hevalbendên rojavayî li hemberî hin garantiyan de amade bin domandina mehandina uraniyomê bi tîratiyek kêm li Îranê de bipejirînin ku destpêkirina wê mehandinê, seretaya vê kirîzê bû. Destkevta din a Îranê renge gef û operasiyonên nepenî û xirabkarane li dijî pirogramên navikî û leşkirî ên Îranê bê sekinandin.

Cuda ji wê ku lihevhatina bi ser kirîza navikî a Îranê çiqas cidî û tevalî ye, lê şik tune ku berjewendî û hêldayînên Amerîka û Îranê wê cudahiyên rijdtir hebin. Yek ji nimûneyên eyankerê vê dijberî û cudahiyê, dijberiya li ser Sûriyê û encama wê li navbera wan de ye. Eger Komara Îslamî xwaziyarê bidestxistina puanên zêdetir de ye, li hember de divê îmtiyazên zêdetir jî bide Amerîka û rojava.

www.arsivakurdi.org

# Îran mafyaya herî mezin a madeyên hişber



Ferşîd Neqşefken

Ligel vê çendê ku karbidestên rejîma Komara Îslamî ya Îranê xwe weke xebatkar û dijberên herî çalak ên ciddî ji bo berlêgirtina ji anîn û şandina madeyên bêhişker li wî welatî di asta cîhanê de didin zanîn, lê belgeyên WIKILIX'ê di sala borî û rapor û rewşa navxweye Îranê nîşan dide ku Sipaha Pasdarên Komara Îslamî ya Îranê yek ji şirîkên herî mezin ên mafya navdewletî ya qaçaxkirina madeyên hişber (narkotîk) e.

Li gor zaniyariyên belavkirî, yek ji bernameyên sereke yên Sipaha Pasdarên Îranê ji bo dabînkirina xercên mezin û çavkaniyên aborî yên xwe, qaçaxkirin madeyên bêhişker bi rêya Îranê ye bo Ewropa. Ligel ku Sipah wek saziyek leşkerî hemû aboriya Îranê xistiye destê xwe û rêve dibe. Ji ber ku bernameyên berfireh ên Sipaha Pasdaran ên leşkerî, sîxorîkirin di welatên din de û piştgirîkirina grûpên radîkal li herêmê û kontrolkirina navçeyên Îranê ku neteweyên Îranê têde dijîn û Kurdistan bi taybet, pêdivî bi xercên mezin heye û ev sazî wan mesrefên bêqas ji rêya qaçaxkirina madeyên hişber bidest tîne.

Parek ji van xercan terxan dike ji bo rêvebirina Hêza Besîc û rêxistina saziyên leşkerî û sîxorî yên girêdayî xwe ku li ser cadeyan û di nav civakê de nerazîbûn û meşan qir dikin û bi tûndûtûjtirîn awayan rûbirûyê xelkê dibin.

Bi vê mebestê Sipaha Pasdarên Îranê Firokexaneya Navneteweyî ya Xomeynî li Tehranê dagîr kir û rêve dibe. Li gor rapora televîzyona Almanya ya ZDF ku vîdeoya wê hat belavkirin, zêdeyî nîva madeyên hişber ku li Afganistanê tê çêkirin, ji aliyê Sipaha Pasdaran ve bi rêya Îranê bo welatên Ewropa tên şandin.

Di sala 2005'an de dewleta Ekvadorê ragehand, ku grûpek Îranî ya qaçaxkirina madeyên hişber binçav kiriye ku zêdeyî yek milyon dolar ji her barek madeyên bêhişker qezenc kiriye û ji sedî 70'ê sûdê vê digihe Hizbulaha Lubnanê. Lêkolînên piştre eşkere kirin ku Hizbulaha Lubnanê tenê yek ji şaxên navneteweyî yê Sipaha Pasdarên Îranê ye di warê qaçaxkirina madeyên hişber de li cîhanê.

Di salên borî de xebatên vê saziya leşkerî ya Îranê di warê qaçaxkirina madeyên hoşber bûye manşeta rûpelên rojnameyên cîhanê. Rojnameya Day Wellt, dahata Sipaha Pasdaran ji qaçaxkirina madeyên hişber bo Ewropa di salên de bêhtirî çendîn milyar Euro dibe.



Li gor raporek nehênî ya Balyozxaneya Amerîka li Azerbaycanê ya ku di Hezîrana 2009'an de hat weşandin, wiha hatiye: "Rêjeya madeyên bêhişker ên kifşkirî ji rêya Îran bo Ewropa bi vî awayî ye: Di sala 2006'an de 20 hezar kîlo heroyîn, di sê mehên destpêka sala 2008'an de, qasê 15 hezar kîlo û di sê mehên destpêka sala 2009'an de, qasê 59 hezar kîlo heroyîn bûye." Li gor vê raporê, şandina madeyên bêhişker bi rêya Azerbaycanê jî tên encamdan. Di raporeke dewleta Amerîka ji bo hikûmeta Bakû'yê, hatiye destnîşankirin ku hêzên ewlekariya rejîma Îranê bi alîkariya berpirsyarên Afgansitanê di qaçaxkirina madeyên hişber de beşdar in.

Ji ber rewşa jeopolotîk ya Îranê ku cîranê Afganistanê ye û li ser rêya tranzîtkirina madeyên hoşber bo Ewropa hilketiye, herdem û nemaze piştî ku Komara Îslamî hat ser desthilatê, Îran yek ji rêyên giring ên şandina û herwiha bikaranîn û kişandina madeyên bêhişker tê hesibandin.

Madeyên hişber bi awayekî gellek berfireh li Îranê tên bikaranîn. Bi taybet di 33 salên borî de ku Komara Îslamî hatiye ser kar, roj bi roj hejmara bikarhênerên madeyên hoşber zêde dibe. Ev yek di rewşekê de ye ku Rêveberê Giştî yê Pêşîgirtin ji Bikaranîna Madeyên Hişber di Wezareta Tenduristiya Îranê Mohsên Wezîriyan di sala 2005'an de ragehang ku 3 milyon û 700 hezar kes bengdarê madeyên bêhişker bûne. Lê ev rêje û statîstîk li gor pêvajoya berfireh a bikaranîna madeyên bêhişker li Îranê bêguman ber bi zêdebûnê çûye. Karnas û pisporên civakî rêjeya tûşbûn bi madeyên hişber li Îranê zêdeyî ji sedî 8'ê didin zanîn.

# Hûn derbarê Kurdên Îsraîlê de çi dizanin?

Ew der Îsraîl e,bi hezaran Îsraîlî hene ku dema tu kok û nasnameya wan jê pirs bikî, bilez û bi bê tu şik û gumanekê xwe Kurd didin naskirin. Lê heke hûn jê pirs bikin ku Kurdên kîderê, bersiv hinek cuda dixuyin. Hinek dibêjin jiber ku bavê bapîrê me Seqizî bûye, bes em jî Seqizî ne. Hinek dibêjin ku bapîr û dapîra me di dema zarokatiya xwe de di taxa Cihûyên Sinê li şeqama Sîros de dijyan, ku piştî wê çûne Tehranê, û di dehsala pêncî an şêstî a zayînî de hatine Îsraîlê. Hinek jî xwe wek Kurdên Kamyarana Îranê didin naskirin.

Gellek ji Kurdên Cihû ên parêzgeha Kurdistan û Kirmaşan û hermên bakûra rojawayê Îranê dema xwe çûne Tehranê, û beşek ji wan jî her di salên destpêka ragehandina serbixweyiya Îsraîlê çûne Îsraîlê, lê hinek jî hene ku berî serxwebûna Îsraîlê rû kirine wî welatî.

Li Îsraîlê de çalakên Kurd ên Cihû hene ku bona parastina zimanê Kurdî gellek hewil didin û bi vî zimanî helbest û sitranan distirin û heta ji xwe re radyoyek herêmî bi îmkanatên sade û kêm ava kirine û hewil didin ku di demek nêzîk de radyoya xwe bikin televîzyonek li ser setelaytê, da ku Kurdên li wir dijîn kok û binetara xwe û zimanê xwe ê şirîn ji bîr nekin.





Helbet gelek ji wan Kurdên Îsraîlî jî hene ku xwe wek Kurdê Zaxoyê li Kurdistana başûr didin naskirin.

Xelkê Kurdistanê jî ji Kurdên Îsraîlê û ji Îsraîliyan pirr hez dikin û bo selimandina vê rastiyê niha li başûra Kurdistanê de kovarekê bi navê Kurd-Îsraîl şap û bilav dikin. Bilav kirina kovarek weha jî serbarê vê yekê ye ku gellek caran birêveberên wê ji aliyê tundrewên Îslamî li Îraqê de gef ji wan hatine xwarin, û heta ketibe ber lêdanên tund û derbên kêran jî, û heta deshilatdarên Îranê jî bi tundî rexne li wan girtine û ew karê wan wek casûsiya bo Îsraîlê bi nav kirine.

Di rastî niha piştî vê ku Kurdên başûrê Kurdistanê, piştî êş û azara bêqas ku ji aliyê hikumetên yek li pey yekê ên dîktator li Îraqê de gihîştine mafê xwe û herêmek otonom ava kirine, Kurdên Îsraîlê jî ketine bin bandora vê herêma otonom, û berdewam kêfxweşiya xwe ji avakirina vê herêmê ku bûye herêma herî serkevtî, û herîbalkêş di rojhilata navîn de, tînin ziman.

BBC.co.uk/persian

www.arsivakurd.org

# Cade û riyên ku mirin jê dibarin!

**N: Neîme Dûstdar**
**W ji Farsî: Arif Velzî**

Hejmara goriyên bûyerên tirafîkê di Îranê de ewqas zor in ku gelek kes dişibînin goriyên şer û bi wê re berhev didin. Çûnku li Îranê de hertim ev egera heye ku kes yan kesên ku dikewin rê û ban yan şeqamên Îranê, renge êdî tu car nevegerin, wate jiyana xwe wunda bike.

Derheq goriyên bûyerên hat û çûnê di Îranê de amarên curbicur tên ragehandin. Lê li gor amarên cîhanî, Îran yek ji 5 welatên cîhanê ye ku zortirîn gorî û qurbanî di meseleya rêk û cadeyan û bûyerên tirafîkê de heye.

Pêka çavkaniyan di 20 salên derbasbûyî de pitir ji nîv milyon kesan di bûyerên tirafîkê di Îranê de canê xwe ji dest dan û her salê jî zêdetir ji 700 hezar kes li wan bûyeran de birîndar yan seqet û kêmendam dibin.

Her çend piştî newroza îsal, fermanderê giştî yê hêza Întizamî ya Îranê ragehand ku rêjeya bûyerên hat û çûnê %15 daketiye, lê her piştî axavtina wî, Ehmed Şucaî, Serokê saziya Pizîşk Yasayî a Îranê regehand ku di navbera salên 1380'ê heya 1389'an de, bi giştî 241.236 kesan di bûyerên tirafîkê de canê xwe ji dest dane. Ew amar diselimîne ku her sal ji her sed hezar kesan, 35 kes di Îranê de li bûyerên tirafîkê de canê xwe ji dest didin.

**Ralî di cadeyên Îranê de**

Eşkere ye ku bûyerên tirafîkê ji sêkuçkeyekê pêk tên: Ajotvan, Tirombêl û Cade(rê). Bûyerên hat û çûnê di Îranê de him ''Sextefzarî'' û him jî ''nermefazrî''in. Beşek ji wê vedigere ser ajotvanan û çanda ajotvaniyê li Îranê de, ku ajotvanên Îranî li dor bêdîqetî û tundajotinê de binav û deng in û gelek ji wan bawerî bi yasa û pirensîpên hat û çûnê tuninin û xwe li serweyî wan dizanin ku eva yek ji sedemên sereke ye.

**Du pêngav ber bi gelî ve**

Berpirsiyarên rejîmê îdea dikin ku hemû rê û cadeyên Îranê li gor standardên cîhanî hatine avakirin, lê gelek ji karnasên vê biyavê li ser vê baweriyê ne ku yek ji sedemên sereke ên zêde bûna bûyeran tirafîkê di Îranê de, ewle nebûna riyan e. Di Îranê de 80 hezar Km rêyên eslî û ferî hene ku ji wê radeyê, 2000km azadrê ne û 5ookm jî li bin çêkirinê de ne.

Herweha li Îranê de cihên bûyerafir zaf in û serbarê destnîşan kirina wan, gavên hewce ji bo kêm kirina asta xeteriyê nahên avêtin.





Birêvebirina şaş ya pilanên avedaniyê sedemek din ji standart nebûna riyên Îranê ye. Ji ber nebûna çavdêrî yan çavdêriyek nedurust û nebûna çavdêrên pispor, gel ji nexşe û pilanan pêka xerîte û darêtina destpêkê nahên birêve birin û bûne sebebê metirsîdar bûna riyan.Herweha gelek ji rê û cade yan şeqamên Îranê tablo yan nîşaneyên huşdarîdanê tunin. Nebûn yan kêmbûna nawendên îmdad û îmkanat û alavên hevkarîkirinê li riyên çiyayî û çîrançep û qerebalix ên Îranê jî sedemek din e. Pêka çavkaniyan, îmkanatên orjansî û tîmên rizgarker û hawardeçûnê yên îmdadê li ser riyan tenê %10 a rêvî û musafiran li xwe digre.

Li Îranê de givaşên saziya standardê jî xwe têkilî lîstika neusûlî û nerikeberiya fabrîka û kompaniyên berhemhêner ên tirombêlan be û bi can û jiyana xelkê re bilîze.

Hewce ye ku kesek ji derveyî Îranê ajotvaniya bi otombîlek Îranî re ceribandibe heya ku hest bi ferq û ciyawaziyên wê bi yên biyanî re bike. Gelek ji alav û qete'yên esasî û sereke yên wê her li gava yekemîn de tûşî pirsgirêk û astengan dibin û kovalîtiya nebaş a wan îmkana lêkdan û mirina musafiran zêde kiriye. Çavdêriya bi ser pêvajoya berhemanîna wan utombîlan bi qasekê li xwarê ye ku nemaze çavdêr û pispor bi xwe jî bûne şirîk û hemdestê berhemanînê û ew pêvajoya xira, xirabtir kirine, rêxistina Standard jî nimûneya eşkere ye.

Tirombêlên berhema Îranê heta îmkanatên herî sade yên ewlehiyê jî tuninin, wekî stop (tormiz)a A.B.S, pereşot yan kîseyê hewa ji wan re nehatiye pêşbînî kirin. Kuvalîteya xirab ya wan jî bûye sedem ku bi derbeyek biçûk wergeriyên yan agir bigrin. Eva jî bimîne ku gelek ajotvanên din bi tirombêlên xwedî eyb ber bi cadeyên ku mirin jê dibarin diherikin.

Eve jî li halekê de ye ku berpirsiyarên Îranê li vê derheqê de gelek xemsar in û bi tiştek asayî nîşan didin. Bi taybetî Serok Komarê Îranê, Mehmûd Ehmedînejad di gotûbêja dawîn a xwe di sala 1390'an de li ser seferê û ewlebûna tirombêlan axivî û ragihand ku ew ewlebûn berî her tiştî vedigere ser ajotvan, piştre tirombêl û cadeyan .

Derheq tirombêlên nestandard jî daye zanîn ku bila kirryar ji wan kompaniyanan nekirin heya ku kuvalîtî û standarda xwe dibin jor: Eva jî çareser yan rêçareya serkomarrrrrrrr!!!!

## Facebook gefek micid, lê veşartî

**Hekêr li ser tora civakî a Facebookê, e-mailên keçikan hek dikin û di hember eşkerenekirina zaniyarî û nihêniyên taybetî ên wan de, daxwaza peywendiyên sîksî ji wan dikin.**

Lêkolerek Civaki li Bajarê Silêmaniyê dibêje ku, heya niha keysa pitir ji 10 keçan li ber destê me de ye, ku seba hekkirina wan ji aliyê hekêran ve, destdirêjiya cînsî û bêhurmetî bi wan hatiye kirin û jiyana hinek ji wan di metirsiyê de ye.

Beşdarên Facebook heya niha digîje 800 milyon kesî û rojê yek milyard caran beşdar serdana Facebookê dikin û herweha Berdevkê Facebookê Barî Sên dibêje ku em rojê 600 hezar hewlên hekkirinê pûç dikin.

## Li Kerkûkê piraniya jinên sunetkirî Kurd in

**Li gor lêkolînan % 38.2 ji jinên Bajarê Kerkûkê hatine Sunetkirin ku % 65.4 ji van jinan kurd in, û digel encamên pir xeter ên diyardeya han berbirû ne.**

Di lêkolînekî de ku ji aliyê saziya Wadî a Almanî û rêxistina Senterî Pena li bajarê Kerkûkê, li ser diyarda Sunetkirina jinan birêve çûye, eşkere bû ku jinên Ereb bi rêjeya % 25.7, û jinên Turkeman jî bi rêjeya %12.3 hatine sunetkirin.

Li gor amaran rêjeya % 40.9 ji Suniyan û, % 23.4 ji Şîeyan û % 42.9 ji Kakeyiyan regeza mê di nav xwe de sunet dikin. Lê di nava Kirîstiyanên Mesîhî de heya niha yek kes jî nehatiye sunetkirin.

www.arsivakurd.org

# Bajarê Selmasê



Di serdemê kevin de Ermeniyan digotine cihê niha ê Selmasê, Kurd Çîya. Herweha navê niha ê Selmasê di zimanê Kurdî û bi zaravê Kurmancî “Selemast” bi wateya bayê hênik ê şefeqê ye, ku bi sebebê nêzîkiya bi behra Urmiyê hertim bayekî hêdî û hênik li wir tê.



Mecîd Cinîkanlû

Şaristana Selmasê bi rûberê 2882 Kîlometra çargoşe li bakûra rojhilatê kurdistanê hilketiye.

Li gorî serjimêriya sala 2005’an, ku ji aliyê dewleta Îranê ve hatiye encamdan, hijmara nîşteciyên bajarê selmasê digîje 180708 kesan, ku ji wan 91796 kes mêr in, û 88912 kes jî jin in.

Şaristana Selmasê li 8 herêmên bi navê: Kinarberoj, Çarî, Şîne Tal, Girdiyan, Şipîran, Kore Sunî, Lekistan û Humê pêk tê.

Ev herême ji aliyê bakûr ve tevî bajarê Xoyê, ji aliyê başûr ve tevî bajarê Urmiyê û ji aliyê rojava ve tevî bakûra Kurdistanê cîran e. Bajarê Selmasê bi rûberê 7 Kîlomêtra çargoşe navenda vî şaristanê ye.

Bajarê selmasê; yek ji bajarên herî ciwan û xweş yên rojhilata Kurdistanê û parêzgeha Urmiyê ye. Selmas dû beşên xwe yên serekî hene, beşek ku dibe navenda bajar û beşa din jî dibe beşa çiyayî, ku gelek daristan têde hene û gelek balkêş e. Beşek ji bajarê Selmasê dibêjnê Kitban, ku niha wekî herêmek dihête nasîn, di serdemê Hexamenşiyan de Selmas ser bi Ermenistanê dihate hesibandin û navê Zarwend danîbûne ser vê herêmê.

Mihemd Resûl Hawar di Pirtûka xwe a bi navê “Tevgera Netewî a Simkoyê Şikak”de dinvîse: Di serdemê kevin de Ermeniyan digotine cihê niha ê Selmasê, Kurd Çîya. Herweha navê niha ê Selmasê di zimanê Kurdî û bi zaravê Kurmancî “Selemast” bi wateya bayê hênik ê şefeqê ye, ku bi sebebê nêzîkiya bi behra Urmiyê hertim bayekî hêdî û hênik li wir tê.

Yaqut Hemewî gerîdeyê Ereb ku li sala 54’an a Heyvî de serdana vî bajarî kirîye, dibêje: Selmas xwediyê bazareke gelek xweş e. Mizgewtek di vî bajarî de heye ku bi keviran hatiye çêkirin û akinciyên bajar Kurd in.

Di serdemê Eşkaniyan de Selmas, herêmekî navbera Îran û Romê de bûye, lê piştî şikesta Xosroyê Eşkanî ev herêm kete ser hikûmeta Sasaniyan.

Yadigarek ji hikûmeta Sasaniyan li Çiyayê Pîrçawiş li ser rêya Urmiye–Selmas li nêzîk gundê Xan Textî bi cih maye ku nîgarê du kesan li ser wî kevrî hatiye kişandin, ku yek Erdeşîrê Sasanî û yê dinê Şapûrê kûrê wî ye.

Selmas ji ber ku cihê xwe yê stratêjî heye, û xwediyê daristanan û xwezaya xwe ya gelek xweş, û avek geleka zêde ye, bûye sedem ku xelik her ji kevin de, li vê herêmê de nîştecî bin. Selmas gelek caran ji encamê şerê navbera Îranê û welatê Rûmê û Osmanî û Rûsiya da hatiye şewitandin, ji ber ku nêzî wan welatan bûye. Li dema şerê Împiratoriya Sefewî û Osmanî da bajarê Selmasê gelek xisar dît, û li gorî gelek pirtûkan, ew bajar bi tewahî ji hêla Osmaniyan ve hatiye xirabkirin û şevitandin, û nîşteciyên Selmasê ber bi bajarên Urmiyê û Xoyê ve reviyane û li wan deran nîştecî bûne. Di sala 1920’î de, erdhejeke gelek mezin li wî bajarî çêbûye û xisarek gelek mezin gihandiye bajar. Padişahê Êmpiratoriya Sasanî Şah Şahpûr girîngiyeka taybet daye bajarê Selmasê, û gelek cihê xweş têda ava kirine û navê bajar jî kiriye Şapûr. Ew nav heya dema şoreşa gelên Îranê jî, her wekî xwe ma. Lê belê dema melayên Îranê deselat bidestve girtin, navê gelek bajaran guherîn, û navê Şapûrê jî hate guherîn û bû Selmas.

Di vê herêmê de êlên Kurd yên Şikak, Donbolî, Celalî û Koresunî jiyanê dikin. Selmas xwediyê rolek berçav bûye di bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd de û rejîma Îranê her dem hewil daye ku wî bajarî bixe bin kontirola xwe de, û li ber vê yekê Azerî li gelek cihên din anîne Selmasê, ku dijî kurdan bikar bînin, gelek erdê kurdan bi sedemên cuda ji wan hatine standin, û Azerî li selmasê dijî kurdan bikar anîne, niha li navenda bajarê Selmasê hijmareka Azerî nîştecî ne, lê piraniya herêmê Kurd in.

Selmas hertim û di dirêjiya dîrokê de li destê Kurdan de bûye û gelek caran xortên vê herêmê ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê xebatekî zaf kirine.

Simkoyê Şikak yek ji wan rêberên azadîxwaz yê Neteweya Kurd e ku bi salan ji bo vê armancê xebat kir û canê xwe di vê rêya pîroz de pêşkeşî neteweya xwe kir.

Piştî bidawîhatina şerê yekemîn ê cîhanî li salal 1914-1918’an piraniya neteweyên bindest ji xwe re welatên serbixwe ava kirin, lê wekî hertim dîrok dîsan bo Kurdan ducarî bû, û tenê neteweya Kurd bû ku negihîşt daxwazên xwe. Li herêma Selmasê piştî îxaneta dewleta Îranê û şehîdkirina Cewer axayê birayê mezin yê Simko, Simkoyê Şikak gehîşte desthilatê û bilez ji bo avakirina dewlata Kurdî hewil da, lê mixabin piştî 23 salan xebat û tekoşînê li sala 1930’î li bajarê Şinoyê de hat şehîdkirin.

Ji kesayetiyên herî naskirî yên herêma Selmasê, em dikarin îşarê bi: Mihemd axayê Şikak, Cewer axayê Şikak, Simkoyê Şikak, Emer xanê Şikak û ...hwd bikin.





**Barak Obama serkomarê DYA:**
" Me di gotûbêjên navikî de tu diyariyek nedaye Îranê. Ya ku bûye para rejîma Îranê, ew gemaro û tehrîmên herî tund in ku li mehên pêşiya me de çavnihêrê wan e, heke ew ji vê derfetê mifayê wernegrin".

**Birêz kekê Sidîq Derwîşî, endamê komîteya nawendî a PDKÎ gotûbêja vê carê a navikî weha şirove dike**:



Sidîq Derwîşî

" Di vê gotûbêja dawiyê a li ser pirsa navikî a Îranê, her du aliyan tenê karîn ku dem û wextê gotûbêjek din diyarî bikin û bi domandina gotûbêjê xweşbîn bin. Helbet berpirsyarên rejîma Îranê ragehandine ku ew mehandina %20 a Oranyomê wê tenê bo reaktora Tehran û reaktorek din wê bi kar bînin, lê bo cihên din ewê tenê Oranyoma %5.3 wê bikar bînin. Di rastî de rohn û zelalnebûna helwestên rejîma Îranê derheq bersivdana bi nîgeraniyên navnetewî, derkirina çavdêrên NY, gefxwarinên li Îsraîlê û welatên hevalbendê Amerîkayê, û axavtinên tundrewane ên rejîma Îranê heya niha jî nekariye ku nîgeraniyên navnetewî û herêmî kêm bike. Her bi vê sedemê welatek wek Îsraîlê şik û guman heye ji wan sozên ku Îran dide welatên 5+1. Lewra ew dixwazin ku rejîma Îranê usul û pirensîpên navnetewî, yasaya NPT, biparêze û berçav bigre, û li ser bingeha vê axavtina Xamineyî ku çêkirina çeka navikî li olê Îslamê de bi heram dizane, bimeşe û vê axavtinê di piratîkê de birêve bibe, û bi vî awayî ji nîgeraniyan kême bike. Bi giştî rejîma ji aliyekê ve dixwaze ku dem û wextê zêdebidest bîne, û zextên navnetewî li ser xwe kêm bike, û ji aliyek din ve rewşa aloz ya aboriya xwe baştir bike".

**Ehmedriza pûrdestan fermandê hêza bejahiyê a erteşa Îranê:**



" Erteşa me di gel hêzên din ên çekdar wê her gef û êrîşek ku aliyê xwe ê piratîkî û eynî hebe, wê bi awayê herî tund tepeser bike".

**Navbirî herweha gefxwarinên Ehmedriza Pûrdestan weha şirove dike**:
" Ew axavtinên tund ên berpirsyarên leşkerî û eqîdetî ên rejîma Îranê piştî hişdariyên tund ên Amerîka û bitaybetî Îsraîlê derheq îhtimala mifahwergirtina ji vebijêrka leşkerî wek rêçareya herî dawî bo kêşe û nakokiya di gel Îranê, û kiryarên leşkerî û dîplomasî ên Amerîkayê li herêmê de, hevdîtina Hîlarî Kilînton di gel Seûd Elfeysel wezîrê Karê Derve ê Erebistana Seûdî û axavtinê Hîlarî Kilnton derbarê cihgirkirina sekoya mûşekiya Amerîkayê li welatên Erebî ên kendawê û manovra esmaniya hewbeş a Amerîka û welatên navbirî bi beşdariya balafirhilgira "UBS întirprayz" û " USS Abraham Lînkoln", zêde bûye.
Rejîma ku di gel bereyek bihêz di asta navnetewî û herêmê de berbirû bûye, û ji aliyek din ve li encama zextên siyasî û aborî, heya qasekê neçar bi paşvekêşanaji helwest û şert û mercên xwe di warê destpêkirina gotûbêjên navikî bûye, bi wan gefxwarinan dixwaze ku tola vê şikesta xwe ya li hemberî rojawayiyan de veke".

**Ehmedriza Abidzade, golçiyê pêşîn ê tîma millî a Îranê**:



" piştî hevpeyvîna min ya bi rojnameyekê re, Dr. Mededî doz bi dijî min daye vekirin, û bi bêy vê ku ez hatibim agehdar kirin jî, di balafirgehê de pasporta min ji min sitandin û bi min ragehandin ku biryara qedexya çûne derve û 54 derbên şelaqan bo te hatiye birîn".



Rehîm Ehmedîpûr

**Birêz Rehîm rEhmadî herweha vê nûçeyê weha şirove dike**:
"Abidzade piştî Nasir Hicazî wek golçiyê herî baş di dîroka 92 salan ya fûtbola Îranê de tê hesibandin, lê bi sedema vê ku werzişvanekî xelkî ye, eva çendîn sal e ku jêre kêşa û arîşeyan pêk tînin. Dema ku Abidzade di maça di navbera Îran û hilbijardeya Çînê de piyê wî derbe xwar, birêveberên yaneya Îstiqlalê û federasyona fûtbolê amade nebûn ku xercê emeliyata piyê wî bidne Dr .Mededî. lewra Mohendis Abidînî û Elî Perwîn li ser hisaba xwe Abîdzade şandin Alman ji bo çareseriyê. Li gorî yasaya navdewletî Abîdzade mafê vê heye ku dozê bi dijî Mededî weke, jiber ku Mededî bi sedema vê emeliyata xirap ku li ser piyê wî kir, ew bo heyamekê ji cîhana fûtbolê dûr xist".

**Rîkardo Olîvra lîstikvanê Birizîlî di tîma Elcezîreya Îmaratê de**:
"ez naxwazim ku carek din bo maçê (pêşbirkêya topa pê) herim Îranê, jiber ku ew otêla ku dabûne me pirr xirap û pîs bû, û ji bo tîmek fûtbolê nedibû, herweha ew otobûsa ku dabûne me jî her bi vî rengî pîs bû û kursiyên wê şikestî bûn".

**Rêzdar Rehîm Ehmedî rojnamevanê werzişî axavtina Rîkardo Olîvra weha şirove dike**:

"Piştî sala 2005'an ku hilbijardeya tîma topa pê ya Alman bi gellek fûtbolîstên xwe ên navdar ve bo lîstikek dostane hate Îranê, êdî ti yane û hilbijardeyek amade nebû bi sedema qorixkirina medyayên sporê, îdama zarokên jêr hejde salî, û binpêkirina berdewam ya mafê mirovan li hember wergirtina pareyek zor jî di gel tîmên Îranê maça topa pê encam bidin.

Yaneya Elcezîre û yaneyên din ên welatên Erebî jî berdewam li dema maçên Asyayî de bi awayê herî baş mêhvandariya yaneyên Îranê kirine. Lê mêhvandariya xirap ya yaneya Îstiqlal bi dilê navbirî nebûye, û di rastî de ew şêwe mêhvandariya girêdayî bi destêwerdana rejîmê di nav karûbarênsporê û îdeolojiya rejîmê ve heye.



www.arsivakurd.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com






Urmiye, gundê Rajan

## 20 hezar mêrên pêgiran di Birîtanyayê de hene!



**Saziya xizmetkariyên Bêhdaşta Netewî ya Berîtanyayê, pêgiraniya 20 hezar mêran eşkere kir û ragehand ku wan mêran daxwaza wan xizmetkariyan kirine ku bo jinên pêgiran berçav hatiye girtin.**

Li gor vê nûçeyê pitir ji heşt hezar mêrên pêgiran, serdana pizîşkên pispor ên nexweşiyên jin û zayînê kirine.

## Kilîsaya Heftewan'ê di metirsiya nemanê de ye

**Li gorî zanyariyan Kilîsaya Heftewanê ku wek yek ji şûnwarên dîrokî ên bajarê Selmasê tê hesibandin tehlûkeya jinavçûnê li ser heye.**



Kilîsaya Heftewanê li gundê heftewan li sê kîlometriya başûra vî bajarî de hilketiye û ew gund xwediyê çend şûnwarên din ên dîrokî ye û kilîsaya Heftewan jî yek ji wan e.

Dîroka vê kilîsayê vedigere bo serdemê hikumeta Sefewiyan û li 19'ê Reşemeya sala 1380'î de ew kilîsa li rîzbenda şûnwarên millî ên Îranê de hatiye bicih kirin.

## Zarokek bi 6 piyan jidayîk bû



**Berî 6 hefteyan zarokek bi 6 piyan jidayîk dibe niha doktor hewl didin zarok vegerînin jiyaneke sirûştî.**

Malpera avesta nûçeyek weşand ku têde balê dikişîne ser vê yekê ku li Pakîstanê zarokek bi 6 piyan jidayîk bûye.

Li gor daxuyaniya Serokê Tendirustiya Enstîtuya Netewî ya Karaçî Cemal Riza dayî çapemeniyê, ev yek ji encama nexweşiya jenetîke di nava milyon kesên jidayîk dibin yek ji wan weha tê dinyayê.

Cemal Riza her weha got ku doktor di nava hewldanê de ne zarok ji vê rewşê xilas bikin û vegerînin jiyana sirûştî.

